

## Çawa wergêr serederiyê li gel têkistê helbestê bike?



**Bilind Mihemed**

Rewşenbîrî û belavkirin, nema tinê dîl di destê hindêk kesan da ku li dûv gêwilê xwe araste bikin, ji bo xizmetkirina layenekê destnîşankirî bi kar bihêt, derbirînê ji hizir û boçûnên wan bi tinê bike û bibe rêkek ji bo rêklam û parastina berjewendiya wan. Eve jî yek ji layenê pozetîvê tora pêzanînên cîhanî ye (net.). Di ser hindê re ku nebaşiyên xwe jî hene ku ji wan jî ewe hemû rêk ji bo belavbûna hemû curên berheman vekirîne.

Belê divêt bihête gotin ku ew dergeh ji bo rexneyê jî vekirîne û wesa berhemên ciwan û li ast, jêk dihêne cudakirin. Li ber kesê ya veşartî nîne ku wergêrana berhemên edebî jî, karekê bi sanahî nîne û zehmeteka mezin pê divêt heta karekê ciwan bi ciwanî bihête wergêran, bi taybet jî helbest.

Proseya wergêrana helbestê, pêdivî bi gelek dahênanê heye, bi wê pileyê her weku tu helbestekê dinivîsî. Wergêr çend kûr helbestê bigehe û di nav naxa wê da aşna bibe, hind dê bişêt dahênanê bike û li gel têkstê helbestê xwe biguncîne.

Divêt ji bîr nekîn ku hebûna bawernameyên bilind û jiyan li welatekê biyanî, nabine heger bo şîyanên wergêrê baş û li ast, karê wergêrê, bi xwe hunere û zaniste di heman dem da. Her wesa pêdiviyê ew kesê bi karê wergêrê helbestê rabibe, şîyanên zimanî yên helbestê hatiye nivîsîn û zimanê helbest bo dihête wergêran yên mezin û li ast hebin û piraniya hêma û dirovên herdu zimanan têbigehe û wergire.

Bi rastî, berelâliyêk di biyavê wergêranê de heye û ew kesên bi vî karî radibin, ne li jêr çavdêriya çî dezgehên taybetmend dikin. Belku her yek bo xwe û bi xweryê dike. Her çende em ji bihayên wan karan kêma nakin û wan karan jî giringiya xwe heye û pêdiviyê bi berfirehî jî bihêne kirin, belê ji ber ku çî dezgehên taybetmend çavdêriyê li ser vî



karî nakin, lewa jî ew bi karekî nerêkxistî dihêne hijmartin û êdiyem û zaravên cûda cûda dihêne bikarînan û dibe caran merem û ramanên durist negehînin.

Helbest jî, ku bi çirûpirî dihête nivîsîn, raman û wateyên cûda cûda digehîne û dipeje, demê dihête wergêran bo zimanek din, hindêk ji wana wate û ramanan ji dest dide, bi taybet heger wergêrî şarezaiyeka temam di herdû zimanan da nebe, nemaze jî di zimanê ku têkstê edebî bo dihête wergêran.

Hindek boçûn hene ku dibe şaş û nerast bin jî, ewe ku dibêjin wergera here baş ewe divêt hizir bihête wergêran, bi ramanek din ku divêt naverok bihête wergerandin, ne ku peyv. Dibe eve boçûn ji bo têkstên zanistî rast be. Ku di vî cureyê têkistê de, dariştina zimanî û çirûpiriyê rol nabe, belku merem jê gehandina hizirekêye. Lê helbestê cûdahiyek mezin li gel vê boçûnê heye, çunku helbest li gel hest û sozan diaxive û soz nebe, helbest jî nabe. Di şîyan da ye peyv bihêne wergerandin, lê wê çawa di şîyan da be hest û soz bihête wergerandin!? Ev çende bi baweriya me dê bi zehmet be.

Helbest, cîhaneka serbixweya cûda ji vê cîhan û ketwarê heye ava dike, lewa dixwaste wê yekê ku werger (ewê bi karê wergeranê radibe) serederiyê li gel wî keş û ketwarê helbest tê da hatiye nivîsîn, bike. Werger di vê proseyê da têkstekê nû ava nake, belê têkstekî heyî werdigire û bizava wê çendê dike ku heman can û jîyanê bide wê têkstê û heman wate, ramanan bigehîne û heman soz û hest tê da xûya bin. Eve jî egerekî here girane li ser milên wergerî û pêdiviyê hewil û bizavên wî cidî bin û bi şarezaiyeka kêr wêne wî erkî bigehîne. Heger na, dê têkst raman û sozan ji dest de û xweşiyê jî nagehîne.

Belê her weku li destpêkê me amaje pê kirî, ku ji ber hebûna tora entirînê û belavbûna wê li seranserî cîhanê û kefitî ye dibin destê her kesekî de û her kesek jî dikare mifayê jê werbigire û weku xwe bi kar bihîne, lewa berhem jî bi cureyê baş û nebaş belav dibin û li pey hizir û dariştina wergerî berhem dihête wergerandin û belavkirin. Lê berhemê baş her dem li pêş ve û peyv di birîqedarin her li kê derê be.